

EKMEK BARIŞ VE

ADALET İÇİN

BÜTÇE



Gece gündüz çalışıyoruz ama geçinemiyoruz, insanca yaşayacağımız ücret alamıyoruz.

Asgari ücretle yaşamak imkansız. Emeklilerin maaşları en temel ihtiyaçları dahi karşılayamıyor.

Kirayı ödeyemiyoruz. Çocuklarımıza ücretsiz okul yemeği verilmiyor. Sağlık ve eğitim parasız değil ve giderek daha pahalalanıyor. Çiftçi ve esnaf borçtan başını kaldıramıyor.

Neden?

**ÇÜNKÜ AKP İKTİDARININ ÖNCELİĞİ
EMEKCİLERİN İHTİYAÇLARI DEĞİL
SERMAYENİN ÇIKARLARI.**

Gelirde ve Vergide Adalet İstiyoruz!

Daha ücretimizi almadan vergi kesiliyor. Sermayeye ise milyarlarca istisna, muafiyet, indirim ve teşvik veriliyor.

Fon vurgunuyla yüz binlerce milyarı cebe indirenlerin ceremesi yeni vergilerle halkın sırtına yüklenmeye çalışılıyor. Hepimiz borca battık, kredi kartı borçlarının faizini bile ödeyemiyoruz. Borçlanmadan yaşayacak gelir istiyoruz! Vergide adalet istiyoruz!

Barış ve Eşit Yaşam İstiyoruz!

Barışı konuşmak aynı zamanda eşit yurttaşlığı, demokratik hakları, kadın özgürlüğünü, insanca ücreti, anadilinde erişilebilir eğitim ve sağlık hakkını konuşmaktır.

Barışın toplumsallaşması için kaynakların savaşa değil yaşama ayrılmasını istiyoruz!

Daha fazla fedakârlık değil adil bölüşüm, daha fazla yoksulluk değil insanca yaşam istiyoruz!

BÜTÇEDEN HAKKIMIZI İSTİYORUZ!

- Asgari ücret en az yoksulluk sınırının yarısı olan 65 bin lira olsun!
- En düşük emekli maaşı asgari ücret seviyesine yükseltsin!
- İşçi olmayan herkese güvenceli iş, işsizlere temel gelir sağlansın.
- Ev emekçisi kadınların primleri bütçeden ödenerek sosyal güvenlik ve emeklilik hakkı sağlansın, kadın emeği sömürsü ve yoksulluğu son bulsun.
- Öğrencilerin ulaşım, beslenme, ders araç gereçleri ve sağlık gibi ihtiyaçları ücretsiz karşılansın.
- Okullarda bir öğün besleyici, sağlıklı ve hijyenik yemek verilsin.
- Küçük esnaf, küçük çiftçi ve hayvan yetiştiricileri hibe, kredi faizi silme yöntemleriyle desteklensin!
- Tüm engelli gruplarına temel yurttaşlık geliri ödensin!
- Vergide adalet sağlansın. Az kazanan az, çok kazanan çok alsın! Servet vergilendirilsin!
- Toplumsal kaynaklar savaşa, sermayeye değil; emeğe, yoksulluk önleyici sosyal politikalara ayrılsın!

Emeğe ve Barışa Bütçe için geçinemeyen herkesi
MÜCADELEYİ BİRLİKTE BÜYÜTMEMEYE ÇAĞIRIYORUZ

BUDCEYA

JI BO NAN

AŞTÎ Û DADÊ



Em bi şev û roj dixebitin lê em nikarin debara xwe bikin, em mûçeyê baş qezenc nakin ku em bikaribin jiyanê hêjayî mirovan bijîn.

Ne mumkin e em bi mûçeya kêmtirîn bijîn. Mûçeyên teqawidan têra pêdiviyên wan ên herî bingeîn ji nakin.

Em nikarin kirêya xaniyên xwe bidin. Ji bo zarokên me li dibistanan xwarinên bêheq nayên dayîn. Xizmetên tenduristiyê û perwerdeyê ne bêheq in û her ku diçe bihatir dibin. Cotkar û karsaz ji ber deynan nikarin serê xwe rakin.

Çima?

JI BER KU DÊRDE HIKÛMETA AKPÊ NE PÊDIVIYÊN KEDKARAN E, BERJEWENDIYÊN SERMAYEYÊ YE.

Em di Dahat û Bacê de Edaletê Dixwazin!

Berî ku em mûçeyên xwe wergirin, jê bac tê qutkirin. Lê ji bo sermayeyê bi milyaran îstîsna, muafiyet, daxistin û teşwîq tên dayîn. Xisara kesên ku bi diziya fonan bi sed hezaran milyar xistin bêrîka xwe, bi bacên nû ji qîsê gel tê xwestin. Em hemû ketin bin deynan, em nikarin faîzên kartên xwe yên krediyê ji bidin. Em dahateke baş dixwazin ji bo ku bê deyn bijîn! Em di bacê de edaletê dixwazin!

Em Aştî û Jiyanê Wekhev Dixwazin!

Aştî di heman demê de tê wateya hemwelatîbûna wekhev, mafên demokratîk, azadiya jinan, mûçeyên baş û mafê perwerde û tenduristiyê bi zimanê dayikê. Ji bo ku aştî civakî bibe, em dixwazin çavkanî ji bo jiyanê werin veqetan-din, ne ji bo şer! Em ne fedakariyên zêdetir dabeşkirineke dadperwer dixwazin, ne xizaniyê şert û mercên jiyanê yên mirovane dixwazin!

EM JI BUDCEYÊ MAFÊ XWE DIXWAZIN!

- Divê mûçeya kêmtirîn bi qasî 65 hezar lîreyan bê zêdekirin ku nivê sînorê xizaniyê ye.
- Divê mûçeya herî kêmtir a teqawid-bûnê bigihîje asta mûçeya kêmtirîn.
- Divê ji bo her kesê bêkar karên ewledar bîr peyda kirin û ji bêkaran re dahateke bingeîn bê dayîn.
- Divê ji bo jinên ku li malê dixebitin prîmên ewlehiya civakî û teqawidiyê ji budceyê bê dayîn, divê kedxwariya jinan û xizaniya jinan bi dawî bibe.
- Divê pêdiviyên xwendekaran ên wekî veguhastin, xwarin, perwerde û tenduristiyê bêheq bîr dabînkirin.
- Divê li dibistanan rojane xwarineke xurekdar, tendurist û paqij bê dayîn.
- Divê karsaz û cotkarên piçûk û ajelvan bi rêya hîbe û betalkirina faîza deynan bîr piştgirîkirin.
- Divê ji bo hemû astengdaran dahata bingeîn bê dayîn.
- Divê di bacê de edalet pêk bê. Yên ku kêmtir qezenc dikin divê kêmtir bacê bidin û yên ku bêtir qezenc dikin divê bêtir bacê bidin. Divê baca dewlemendiyê bê bicihanîn.
- Divê çavkaniyên giştî ne ji bo şer û sermayeyê ji bo kedê û polîtîkayên civakî bîr veqetandin.

Em bang li her kesî dikin ku ji bo debara xwe têdikoşe,
WERIN EM TÊKOŞÎNA BUDCEYA KED û AŞTIYÊ XURT BIKIN

BUTÇEYA

SEBA NAN

AŞTÎ Û DADÎ



Ma şew û roje xebitîyenê la ma nêeşkenê debara xo bikerê, ma destmizêko baş qezenç nêkenê ke ma bieşkê cuyêka sey merdiman biciwîyê. Mumkin nîyo ma bi destmizê tewr tayî biciwîyê. Destmizê teqawutan qîmê hewcedarîyanê înan o bingeyênan zî nêkeno.

Ma nêeşkenê kirêyanê keyeyanê xo bidê. Seba gedeyanê ma wendegehan de werdo bêheq nîno dayene. Xizmetê weşîye û perwerdeyî bêheq nîyê û her ke şîno hîna vay benê. Citker û esnafî semedê deynan nêeşkenê sereyê xo wedarnê.

Çira?

ÇUKE DERDÊ ÎQTÎDARÊ AKPYÎ HEWCEDARÎYÊ
KEDKARAN NÎYO, MENFEETÊ SERMAYEYÎ YO.

Ma Destmiz û Bacî de Edalet Wazenê!

Verê ke ma meeşanê xo bigîrê, ci ra bac yeno kiştene. La seba sermayeyî bi milyaran îstîsna, muafiyet, kêmkêrdîş û teşwîq yenê dayene. Zerarê kewanê ke bi dizdîya fonan bi se hezaran milyarî kerdî tûnika xo, bi bacanê neweyan şarî ra yeno waştene. Ma pêro kewtî deynan bin, ma nêeşkenê faîzanê qertanê xo yê kredî zî bidê. Ma destmizêko baş wazenê seba ke bê deyn biciwîyê! Ma bacî de edaletî wazenê!

Ma Aştî û Cuyêka Seyyewbîne Wazenê!

Aştî yena vateyê hemwelatî-bîyayîşê seyyewbînî, heqanê demokratîkan, azadîya cinîyan, destmizê merdimane û heqê perwerde û weşîye yê bi zîwanê dayîke. Seba ke aştî komelkî biba, ma wazenê çimeyî seba cuye bêrê abirnayene, seba şer ney! Ma fedakarîyê hîna vêşî ney parekerdişêko dadperwer wazenê, feqîrîye ney şert û mercê cuye yê merdimane wazenê!

MA BUTÇEYÊ RA HEQÊ XO WAZENÊ!

- Ganî destmizo tewr tay hendê 65 hezar lîra bêro vêşîkerdene ke nîmeyê sînorê feqîrîye yo.
- Ganî destmizo tewr tay ê teqawutan bireso destmizê tewr tayî.
- Ganî seba her keso ke bêkar o karê ewleyî bêrê peydakerdene û bêkaran rê destmizo bingeyên bêro dayene.
- Ganî seba cinîyê ke keye de gureyênê primê teqawutbîyayîşî butçe ra bêrê dayene, ganî kedwerdena cinîyan û feqîrîya cinîyan biqedêyo.
- Ganî hewcedarîyê wendekaran ê sey res, werd, perwerde û weşîye bêheq bêrê dayene.
- Ganî wendegehan de roje camêk werdo baş û pak bêro dayene.
- Ganî karsaz û citkerê hurdîyî û wayîrê heywanan bi rayîrê hîbe û betalkêrdîşê faîzanê deynan bêrê piştgirîkerdene.
- Ganî seba heme astengdaran destmizo bingeyên bêro dayene.
- Ganî bacî de edalet estbo. Ganî kesê ke vêşî qezenc kenê baco vêşî, kesê ke tay qezenc kenê baco tay bidê. Ganî baco dewlemendîye bêro caardene.
- Ganî çimeyê pêroyî ne seba lej û sermayeyî seba ked û polîtîkayanê komelkî bêrê abirnayene.

Ma veng danê her kesê ke seba debara xo xo ver danê,
BÊRÊ MA XOVERDAYÎŞÊ BUTÇEYA KED Û AŞTÎYE XURT BIKERÊ